Kirîza Siyasî Li Îranê

Kakşar Oremar
Email: kakshar_oremar@yahoo.de

Piştî 2500 salan yek ji sedemên têkçûna sîstema seltenetî li Îranê ew bû ku pirensîpên li ber çavgirtina mafê mirovan hatibûn ji bîr kirin. Şah xwe wek **"siya Xûdê li rû erdê"** binav dikir û bibû dîktatorekî mezin. Şoreşa gelên Îranê bi wê hîviyê bû ku gula demokrasiyê bibişkive û bêhna xwe li her derê belav bike, lê piştî 30 salan ku komara îslamî li ser kare, ne demokrasî heye û ne jî mafên mirova xwedî bihayek giranin. Gula demokrasiyê bi hezar şêweyan hatiye perçiqandin. Gel bi wê xweziyê bûn ku di cîhanê da xwedî jiyaneke xweştir ji berê bin. Berxwedana gel ya li dijî rejîma Pehlewî bo çêkirina cîhaneke baştir bû, lê rojekê li Kurdistanê, roja din li Belûçisatnê û carna jî li bakurê Îranê, qira gel bû karê sereke yê rayedarên komara îslamiya Îranê.

Vê carê gelên Îranê bi hîviyên mezintir di hilbijartinên serokkomariyê da beşdarî kirin. Sextekarî di hejmartina dengan da bû sedema serhildana gel. Berxwedana gel hîviyên mezin afirandin, lê bi darê zorê û xwînê ev rê jî li ber gel hate girtin. Elbete gel hilbijartin kire sedemek ji bo nîşandayîna dijberiya xwe ya li hemberî sîstema serdest. Daxwazên gel gelek mezintir bûn ji hilbijartinê. Çimkî gelên Îranê li pey demokrasiyek rastîn digerin û dixwazin bi her bihayekê wê bi dest

bêxin. Ew ji bo tiştekî wiha rijyane nava kuçe û kulanên bajarên mezin. Bi taybetî jî ciwana bi evîneke bêdawî singê xwe dane ber gole û sernîzeyên pasdarên dewletê. Ev nîşana vê rastiyê bû ku sewiya rewşenbîriyê di nava ciwanên Îranê da gehiştiye astekî bilind. Şêweya hilbijartinên vê carê bi hemû rengên xwe berevajî pirensîpên demokrasiyê bû. Di destpêkê da me dît ku zêdetir ji yek milyon kes hatin nava kulanên bajarê Tehranê, lê heta yek şîşe jî neşkandin. Gel xwest tenê bi awayekî aştiyane dengê xwe bigehîne guhê berpirsyarên komara îslamî. Piştra berxwedana gel û piştgîriya hinek kesayetiyên naskirî bû sedem ku şer di navebra alîgirên dewlet û reformxwazan da derkeve.

Di destpêkê da ji ber sansûra giran, Xaminêyî û Ehmedînejad xwestin ku dengê gel di qirka wan da bifetisînîn û nehêlin ku hawara wan bigehe dervey sinorên welat, lê aqibeta desthilatdariya ku tejî cehalet û bêaqilî be, ji vê baştir nabe. Gelên Îranê dixwazin xewnên xwe yên gehiştina bi civakeke azad bigehînin rastiyê. Serhildana dijî hikumeta dîktaorekî mîna Mihemed Riza

li Pehlewî jî bo vê xweziya mezin bû. Mixabin rêya şoreşa gelên Îranê ber bi mesîrekî din hate gûherandin an jî baştire bêjim dîktatorekî xedar cihê xwe da dîktaorekî cinayetkartir û hovtir!. Ew kevneşopiya ku xwedî temenîkî çend hezar salî bû, rêya xwe berdwam kir û xwedî mesajeke wiha bû:**” Hikumet çi dibêje, divê gel bipejirîne!”**

Vê carê dijberiyên gel rastiyeke dîrokî ji cîhanê ra dan îspatkirin: **astengî û sinordarkirina azadî û gehiştina bi demokrasiyê çiqas ku giran û sinordar bin, nikarin rê li ber berfirehbûna şoreşa gel bigirin. Şoreşa gel yê mîna rûbarekê rêya çûyîna xwe peyda bike û rojekê bigehe deryayê...”**

Refsencanî yek ji hevkarên Xumêynî û Xaminêyî vê carê di xutbeyên nivêja înê da axivî û behsa kirîza heyî li Îranê kir. Elbete beriya wê xuyaye ku ew bi hevra şiwirîne û di rewşeke wiha hesas da Refsencanî li ser kirîza siyasî, tehlûkeyên ku têkçûna sîstema komara îslamî tehdîd dikin, axivî. Ev tev ji bo bêdengkirina gel in û bes. Kirîza ku heya niha bûye sedema kuştina 500 kesan û zêdetir ji 5000 kes jî di şertên herî nexweş da hatine girtin ku rayedarên dewletê vê rastiyê bi hezar rêyan vedişêrin!!.

Ez bawerim ku rêyên jêr yê bo demeke kin Îranê ji vê kirîzê rizgar bikin, lê êdî dijberiya gel ya li hemberî sîstema serdest bûye agirê jêr xûliyê û ev volkan yê rojekê zû an dereng bipeqe. Ew roj jî zêde dûr nîne.

1. Careke din di bin çavdêriya nunerên UNê da hilbijartinên serokkomariyê bi awayekî demokratîk bêne kirin.

2. Xamnêyî ji serokatiya olî ya Îranê bê avêtin û dawa lêborînê ji hemû gelên di erdnigariya Îranê da bike.
3. Sansûr li ser çapemeniya azad û berbendkirina çalakiyên siyasî-sivîl bên hilanîn.
4. Hemû girtiyên siyasî bê şert û qeyd bên azad kirin. Bi taybetî kesên ku piştî hilbijartinên serokkomariyê yên vê dawiyê hatine girtin.
5. Hemû cûre şidet ku ji hêla hêzên besîcî û sivîl ve têne kirin, bêne sekinandin û kesên sûçdar bi awayekî qanûnî bên cezakirin.
6. Ji wan malbatên ku kur an jî keçên xwe ji dest dane, dawa lêborînê bê kirin. Herwiha ziyan û zirara ku gehiştiye gel bê dayîn.
7. Di zagûna bingehîn da hinek gûherandin bêne kirin û mafên kêmnetewên millî(Kurd, Azerî, Ereb, Belûç û hwd) bi awayekî şefaftuir bên diyar kirin.
Û .....

Elmaniya 19. 07 . 2009